

Demokrati ji welêt re
û mokirkirina mafê
çarenûsî ji gelê Kurd
re, di sûriyê de.

DENG

Jimar : (56)
Ber -ile
Sal : 2003 z - 2615 k
Biha : (15) L. S

Rojnameyeke mehane ye ji weşanên partiya hevçêrtina gelêrî Kurd li Sûriyê

Sergotar

Darajtina bêjeyan

Ka gotin ji kirinê ..?

Ji roja ku, Kurdên me li Sûriyê hevî û daxwazên xwe di xelesa saziyê de rêxistinî de çespendin û saz kirin; hîn ti caran gotin û kirinê li hev nekirine . Yanê, gotin li alikî ne, û kirin jî tune, yan jî li aliyekî dine . Lê, her carê jî dihat gotin - di hemî qonax û guhertinan de - ku, divê em ji vê rewşê derkevin, û çara duristkirin û derketina ji bin bandora mejiyê şaş û nêrîna çewt bibînin .

Helebt ev rewşa han, bi qelsbûna kar û çewtiya nêrînê, bibû sedema parçebûn û şerpezekirina tevgera me û her tim jî dihat gotin ku, destin ji derve û pîlanên rijimê di hundirê tevgerê de cih girtine. Karê hilweşandin û ketina çî hêz û nêrîna ku, dixwaze doza maf û kesîtiya miletê Kurd bike, dîkin . Lewre, di bin vê nêrîna han de, û girêdana her tiştî, û her ketinekê, bi wan pîlan û destan ve. Nexweşiyên me hino hino bêtir dibûn, û cihekî kûr di mejî û laşê tevgerê de digirtin .

Lê, piştî ewqas sal ji kar û xebatê, û piştî ewqas parçebûnên ku, di hundirê tevgerê de bikar dihatin, nêrînên ku, xwe wek dezgehên fermî, ji kar û barê Kurd re nîşan didan û li gel guhertinên ku, di seranserî cihanê de, û di hemî waran de, cih digirtin, hîn em di wê xelesa gazin û loman de bê ku, em dest bi ser birinê din, û bibêjin cima û çawa em gihane van astengên rêzanî, rêxistinî û zanistî ?.

Di bawerîya me de, astenga tevgera me, û ya herî sereke, him tenegehîştina wê ji guhertinan re, û him jî, ji girêdana hinan ji wan bi pîlanên desaletê ve tê, lewre hercarekê ku, D .. R .. 3

**Xeleka (7)
Memê Alan**

Birastî cudatî di navbera bêjeyên salt û sade, pêkhati û hevedudanî de, hevda mûyê Mû'awiye ye, yanê pir zehme te . Wêlomê jî, gelek xwendekar, nivîskar û ta zimanhezên zimên, pir caran wan tevlihev dîkin . Ji ber vê yekê min pêwîst dît ku, zelalbûn bi vê mijarê gereke .

Ta ku, em karibin bi hêsanî ji hev cuda bikin, pêdivî bi danasîna kî, bêje û darajtina bêjeyan (çêkirina bêjeyan) heye. **Kît:** Beşek bêjeyî ye ku, bi yek carê re, ji devê mirov derdikeve û ji bo her kîtekê pêdivî bi tîpek dengdêr heye. Yanê tîpek dengdêr dikare bi serê xwe, yan jî digel çend dengdaran, kîtekê pêk bîne . Kît bi serê xwe dibe bi wate yan bê wate be... D .. R..5

Lîsteya romanên kurdî (kurmancî)

Ibrahîm Seydo Aydoxan

Hin îstatîstîkên li ser romanên kurdî:

Romana yekem ya ku, bi kurdî hatiye nivîsandin. Şivanê Kurd e. (Ereb Şemo).

Lê belê çapa vê romanê ya ku, di destê me de heye, ji zimanê fransî hatiye wergerandin. Wergera wê ya firansî jî ji zimanê rûsî hatibû girtin. Ji ber ku, heta niha kesekî Kurdiya wê ya pêşîn ku, wergera rûsî jî wê hatiye girtin bi dest nexistiye (bi dest xistibe jî kes pê nizane), çapa ku, niha di destê me de heye weke ya orjînal tê qebûl kirin.

II- Bi giştî, hejmara romannivîsên ku, heta niha hayê me ji wan çêbûye 46 e. ... **Dûmahîk .. R .. 11**



Çawa dêw bûne şeytan ?! (*)

Ehmed HESEN

Babeta lêgerîna rehên bêjeyên zimanekî pêwêstî bi gelek cureyên lêkolînên zimanvanî heye, nemaze yên danganî (pêkguherin dangan), yên nîşanewî (wateya binereti û ya ûyên taze) û yên berawirdkarî (hevberkirina bêjeyên zimanên, xizmên hev). Herçende me timayî heye, em di paşerojê de, tiştekî firehtir di warê êtimolojiya «1» bêjeyên kurdî de binvîsin. Lê, ji ber gelek sedeman, bi taybetî nebûna jêder û serçaweyan; em hê jî dûrî karekî weha cidî û tekûz in .

Di pêşiya vê hewildana xwe de, emê ji çarçêweya dinî û mîtoloji dest pê bikin : Nimûneya meya vê carê bêjeya dêw e .

Regê vê bêjeyê ji ya Evistayî dêve hatiye. Di Evista de, dêve ji aferideyên (mexlûqat) xirabî û ziyankariyê re, tê gotin . Ev nav bixwe di zimanên Aryayî (Hindûirani)yên ditir de navê Xudê ye «2» .

Di sensikritî (zimanê fermî û wêjeyî Hindîyan aryayî) de ji dêva navê Xudê ye . Guman di wê yekê de nîne ku, dêva bi wateya Xweda kevintir e ji dêve bi wateya aferideyê ziyankar (dêwê taze). Ji ber ku, ev bêje bixwe derbasî nêv zimanên Ewropiyên kevin bûye ji bo derbirîna bîr (fikir) a Xwedê. «3». Rehê vê peyvê div e, an ku, (dibirûse, diise, şewq dide) « 4 ». Ev çende ji rastiye ne dîr e, çûnkî em dizanin perestina«ROJ»ê yan «ronahiya gewre» li nav gelek miletan belav û baw bû .«5». Li nik Girekiyan (Yonaniyan) dêve bûye Zêyûs û Jûpîter (Diyês pitêr), li nik Lafinan bûye Diyûs, li nik Litwaniyan Diyêvas, li nik Cirmaniyan ji bûye Ziyo yan fir .«6»

Bikaranîna bêjeya dêve bi wateyê dijber ((dêw, şeytan)) di zimanên Îranî de ((helbet kurdî jî di nêv de)), dijberiya di navbera dinê Zerdeşt û yê Vêda nîşan dide. Gumana xurt ew e ku, ev yek di dema jihevûna herdû gelên Îranî û hindî de pêk hatibe.

Lê gelo, çawa vê guherîna rû daye ? . Îro, gava em seyrî bawerî û dogmên " mu,teqedat " herdû gelên navbirî dikin; em gelek baweriyên seretayî yên sade yên hevpar ((hevbeş)) di wan de dibînin. Ev jî tê wê wateyê ku, ev hemanên dinî yên seretayî di dewraneke gelekî kevin de çêbûne ku hê jî herdû gel ji hev cuda nebûbûn . Bermaya tek û tenê ji vê dewranê mayî ku, tê de nîşan û şopên wê serdemê iro tînin. Pirtûka dîniya hindîyan Rig-Vêda ye.

Ev pirtûka ku ji komelek sirûdên dinî pêk tê, serdemekê nîşan dide ku mirovên arîniyad tê de,

êdî ji jiyana koçerî berê xwe dane jiyana xanenişîni (dêmanî) .

Di vê serdemê de – belkî jî di serdemên piştî wê de– dogmên gelên Aryayî li ser binemaya pîrozgirtina (teqdîsa)hemanên suruştî yên sûdmend hatine avakirin, ku, li şûna Xwedayan perestina (îbadet) wan dikirin . Asman, ronahî, agir, roj, erd û av hemû ji hemanên pak û pîroz bûn. Beranberî wan, hemanîni ziyankar û wêranker dihatin nasîn : Tarîfî, hişksalî, serma, nexweşî û yên mîna wan ji hemanên Ehrîmenî (şeytanî)û lanetlêhafi dihatin jimartin. Li ser vê bingehê, hêzên kara (fa'îl) li vê cîhanê li gora xelkên aryayî du deste bûn : Yek Xudayên qenc û avaker û yê di Xudayê xirab û wêranker. Belam her ku rojgar berve pêş dihat Xudayên qenciye gewretir û bihêztir dibûn û paygeha wan bilindtir dibû. Dinê mihrperestî (mîtrayîsim) yê ku, berî Zerdeşt derket û li seranserî Îranê belav bû, guherîneke ditir di dogm û baweriyên xelkên Aryayî de peyda kir û berê wan da yekanperestiyê (tewhîd, monotêyîsim). Lê, belê bê ku, wan bighîne yekanperestiya serberdayî. Ji nêv hemû Xwedayan Mihr (Mitra) cihê herî bilind girt û bû geretirîn xuda, lê, ne Xwedayê yekane .

Ev guherîna mezin bi derketina Zerdeşt re qewimî, lewra Ehora Mezda ne tenê gewretirîn û bihêztirîn Xweda ye, herweha Xwedayê yekane yê tuwana (qadir) û tekûz e .

Zerdeşt bangeşîya dogma çendxudayîyê (polîtêyîsm) nekir. Belkî hewildan û têkoşîna wî ji bo jinavbirina wê bû .Wî Xwedayên Aryayî yên berê ji paygeha Xwedawendiyê daxistin xwarê û ew rêwîna û rêwindaker li qelem dan û peyrewên wan jî «dêwperest» binav kirin*. Ji ber vê çendê bêjeya dêw ku navê Xwedayên kevin bû, û hê jî di zimanê Hindî de, bû navê şeytan û aferideyên Ahrîmenî heman wateyê dide. Lewre ev Xwedayên ha di ola Zerdeşt de, bûn şeytan. Zerdeştîyan ji xwe re « mezdyesnan » digotin, an ku yên perestina EhoraMezda dikin. Herçî peyrewên Xwedayên kevin ku bawerî bi dinê Zerdeşt nanibûn Zerdeştîyan ji wan re « dêvyesnan » digotin, an ku, yên perestina dêw dikin .«7»

Perawêz û jêder

1- Êtimoloji : Lêkolîna zanistî ya kokên bêjeyan .
2-G.de La Font, L, avesta, p.177, Chamual, Paris 1897.

3-Heman jêder .

4 –Heman jêder

5-2001

17

→ 4

Bi Kurmanciya Pîr...

Îslam û Nijad

Pîr RUSTEM

pirstem@amude.com

Cindirês-2003



Eger ku, em hinekî paş de veşerî û li dîrokê binrin û wê bidin vekolîn, emê li pîr rasteqînên veşartî, ewên ku, di bin toz û dûseyên gotûbêjên xapînok de hatine windakirin rast werin û têbighên ku, em weke miletekî cuda û xwedî netew û çandêke başqe pîr hatine xapandin û heya bi nuha jî tî xapandin. Lê her carekê di bin navnişaneke cuda de û yek ji wan caran; di bin navê Ola Islamê de.

Erê, evê ola nuh û nemaze di destpêkê de; dema ku, ew hine qels û lawez bû bang li biratî û wekhevîyê kiribû û gotibû: "Ti berztirîn ji yê Erebb di ser yê Ecem re tune; tenê bi ayîntiyê". Lê, ewê di demên dûtir re; di rojên ku, evên serdest di bin xwedî hêzeke aborî, leşkerî û dewleteke xurt; evan soz û durûşmeyan ji bîr dikin û tenê du rîyan ji "Yê Din" re dihêlin; an dev ji ola xwe ya berê berde û were ser rîya wan û ji wan re weke kole "mewle" bixebite, yan jî kuştin li pêşiya wî ye û heya rîya sêyemîn jî ku, ew li ser ola xwe ya berê bimîne û vêrgê "ciziyê" bide wan û bi fermana Omer bin XETAB re, nema bû.

Û eger ku, em li gotûbêja çûyî bi xwe jî veşerî û wê şirove bikin, emê têbighên ku, ew di hundirê xwe de, bi xwe jî cudatîyekê dixê navbera nijadan; Gava kesên Erebb weke nijadeke tekane bi nav dîke. Bi ser de jî li pêşiya guftûgoya xwe datîne û van hemû nijadên din di bin yek gotinê de; (Ecem), bi nav dîke û hine bêtir jî, ev ola nuh; (Islam), ji ba wan derketî û wîlo ew in xwedî ayîntiyê û her ewên weke nijada herî bi nîrx û berztirîn be.

Lê, em dikarin dêst ji van şirovekirin û listikên bi zimên û gotinan bikşînin, tevî ku, ew "iicaza" Quranê bi xwe ye jî û gereke ew nîşandeyên ji evan tonrengan û bê dudilî bipejirînin, an jî divê ew jî dêv ji vê çêroka zimanê Quranê û "iicaza" wê berdî. Me got: Emê ji listina bi gotinan bi dîrkevin û pal bidin ser bûyer û kiryarên di derheqê mirovên ku, bi nijada xwe ne Erebb bûn û tenê hinek nimûneyan binin zimên. Ji ber ku, ev quncikê me fêra wan rûdan û komkujîyan tevan nakin. Ji berî hertîstî û heya di demên pêşî jî vê ola nuh,

rîya koletiyê û tenê ji yê ne Erebb re dihate pejirandin. Ji ber ku, çenedibû yê Erebb bibe ji "mewaliya" û tenê du rê li pêşiya wî bûn; An kuştin da ku, ew nebe kole yan jî divê bibe misliman û wîlo ewê bibe yê serdest. Lê, ji Eceman re rîya sêyemîn jî vekirî bû. Tîstê din û weke di xelekên çûyî de jî me dit ku, mêrê Erebb dikarî bi jineke ji "mewaliyan" re bizewiciya, lê, çêne dibû ku, yekî ji "mewaliyan" jineke Erebb ji xwe re bîne, tevî ku, herdu jî mislimanin û birayên hev ên yek olê ne.

Bi ser evan ferman û cudatîyan de jî û eger ku, em li nameya Omer bin XETAB^{***}; Ewa ji Ebo Mûse ELEŞERÎ, waliyê Besra re bi rêkirî û tê de rê dide wî ku, evên din; Eceman bide ber devê şûrê xwe û ... H.W.D. Û di dû re jî, ne pejirandina mislimantiya yê ne Erebb da ku, vêrgê ji wan bigrin û gencyên xwe bêtir zengîn bikin û serdestiya yê ne Erebb jî bilindtir bibe û ... nimûne pîr in.

Û emê robarên xwînê û komên seriyên jêkirî ku, Mislimanan li welatên Eceman meşan dibû û dabûn ser hev, ji mijareke din re bihêlin. Bi ser de jî, rewşa miletê me yî KURD û asimlekîrîna ziman û çanda wî, ji bal a Erebbî ve, evê çêroka û bê perde aşkere dîke. Ne tenê wîlo û mixabin, heya kesîtiya me ya netewî jî hatiye asimlekîrîna û eger ku, me karîbû ji Selah D. EYOBI re, kar û xebatên wî bipejiranda û bigota: Ew li gor dema xwe çûbû, lê ji yekî weke Dr. M. S. Remedan ELBOTÎ re û di roja îro de ku, kes nema ye û li xwe xwedî dernakeve, ew were û ji bo "Yê Din" nijad û netewa xwe tîxe bin sola xwe. Vêca û eger ku, ev ne asimlekîrîna dê çibe.

Lê, tîrsa mezin ewe ku, di roja îro de û di bin nav û durûşmeyan nuh de; Weke hemwelatî û cigrafiya de, em careke din werin xapandin û bi sedê salan bi xwe bikenin û bibêjin: Em û we birayên hev in û ji bîr bikin ku, di jîyanê de du zarawên din jî hene. Bîndestî û serdestî û rewşa û heyama îro derfeteke mezin ji me re, weke miletekî bîndest, vekirî ku, em jî hilkişn radeya evan miletên derdora xwe.

Sergotar .. Dûmahîk

doza kar tî kirin, an pirojeyek di wî wari de berçav dibe. Em dibînin ku çawa ew tevger jî ser hev tar û mar dibe û ew piroje tî hilweşanin li gor ku, dihat xwestin û kar jêre dihat kirin . Vêca, pîrs ew e, kengî wê tevgera me karibe gotinê bi kar ve girêde, û ew şeweyên kar - weke yê ku, di wan xwepêşedanên dawiyê de bi kar hatine - ji çalakîyên xwe rake .. ?

DENG

Naman NOROZ a DENG

Di çelê Baran de beşdarên hêja



Di destpêkê de, em sipasiya xelkê Kobaniyê, heval, dost û malbata nemir, Baran Kendeş, dikin, li ser vê vexwendina ku, bihêle em bi tev de, nemirê xwe, di çelrojîya koçkirina wî de, di bîra xwe binin ..

Belê, vexwendinek, beşdariyek weke vê, cihê rêzgirtin û serbilindiyê ye li nik me. Çimkî ew di hest û mejiyê her mirovekî de, nemaze welatperwer û rewşenbîr, xêzeke stûr û naverokeke bingehîn sînor dike. Ji ber her mirovek wê bighêje wê rasteqîna ku, dibêje: Mirovê Ku, jiyana xwe di xebat û xizmeta milletê xwe de kuta ke, çî rewşenbîr, hunermend, an partîzan û welatperwer be, wê di rojêke wek vê rojê de, û bi wefadariyêke weke vê, berhema keda xwe qezenc bike ..

Lê mixabin, ku di pêvejoya milletê me, û di warê kar û xebatê de, gelek mirovên ku temenê xwe gorî doz û daxwaza milletê xwe kirin, ta rojên îro ew wefadarî ji aliyê milletê xwe de nedîtine, û di hest û mejiyê nîşê nû de cih negirtine .

Îro, em li bajarê Kobaniyê, di nav şîna li ser kockirina nemirê xwe Baran de, şahiyekê berçav dikin. Ew jî ewe ku, em hest û ziman di xelesa hezkirina xwe û girêdana xwe bi mirovê ku, temenê xwe di ber me tevan de, di warê huner û çalakîyên wê de, dawî lê anî, sînor dikin .. Tevî ku, ji bîra me nace jî, ev bajarê Mişoyê Bekebûr, Ebdî neisan, Ebas, Findî Findê, Mihemed Salih xano, Mistefayê Elaş û yên weke wan e.. Bêhtirî vê yekê jî, divê li ber çavan be ku, ne tenê partîzan û kesên ku, di warê siyasê de dixebitin; hezkirina xelkê xwe bi ber xwe ve dikşînin. Belê bi tev wan, rewşenbîr, xwedî nêrîn, hunermend û welatparêzê serbixwe, ew jî di eynî xelekê de ne. Çimkî tevgera miletekî bindest divê van baskan hemî hembêz bike, û li wan xwedî derkeve; da ew tev de li milletê xwe bibin xwedî ..


Tenê ma em bêjin ku, em li mirovê xwe, û di jiyana wî a zindî de xwedî dernakevin, û xwe lê nakin xwedî; tenê di mirinê de, şahiya kombûnekê didine ber dilê dost û malbata wî. Lê, ya rast ew e ku, em qedir û rêzgirtina nemir di jiyana wî de lê vegehin; ne ku, di bin nîr û bandoriya pariyê nêr de bihêlin ta roja koçkirinê. Ev jî stubariya hêz û maldarên Kurd de, berî her kesî din ku, li mirovên xwe yên xwedî vîn û ked, xwedî derkeve ..

Li dawiyê, em dilovaniyê ji nemir re dixwazin, û temenekî dirêj ji we re .

19/12/2003

Komîteyên rêvebir
DENG - NEWROZ

Birûsk



Li 12.12.2003an, şevêk rewşenbîrî bi beşdariya giropek rewşenbîr (Nivîskar helbestvan ... H.W.D) Bi boneya bîranîna nivîskarê hêja Mustefa Elaş (Bavê Rewan) hate li darxistin .

Herdû komîteyên rêvebir yên rojnameyên Newroz û Deng ev birûsk ji wê şevê re rêkirin .

Beşdarên xoşewîst; Silav û serkewtin ji we û şeva we re .. !

Birastî em bi van ton kar û çalakîyên weha serbilind in û emê pir bi kêfbana; Eger em bi were bana . Ji ber ku, we bi vê çalakîyê du çûk bi kevîrekî gêrkirin . Him we nivîskarekî hêja mîna kek Mustefa bi bîra xwe anî, û him jî we karekî kultûrî û serkewtî pêk anî . Lê, em hêvidar in ku, hûn çalakîyên weha berdewam bikin û hercarekê hûn diyarî xebatkar û rewşenbîreki Kurd ji Kobaniyê - yên ku, ji nav me barkirine - bikin ta ku, hemî wek hev di bîra gel de bijîn .

K. Rêvebir
yên rojnameyên
DENG - NEWROZ

Çawa Dêw .. Dûmahîk

6 -G. de la Font, L'avesta, p57

7 - Di vir de, me bêtir xwe sipartiyê gotara ((Zerdûşt ve usûlê dîne zerdûştî)), Dr. Muhemedê Muhemedî, meceleyê eldirasat eledebiye, salê çîharom, şîmarhayê 2, 3, 4, sefhiyê 323-324, danişgahê Lubnan, Bêrût, 1341.

*- Zerdeşt jî mîna gelek pêxemberên di baweriyên olî yên berî xwe betal dikirin .

(*) Ev gotar ji Internêta hatiye girtin .

QÊRÎNEK

Di guhê Berpirsiyarekî de ..



Ber, her tiştî kurd im, serbilindim ne bi tirsim û li her derê navê min qehreman û leheng in. Ji min dipirs in tu kî ye, Misilmane an Kurde.. ? Ger ez çî bêjim, dibêjin na tu tune yî. Raste gelo, ev Kurdayetiya li serê me bûye telam û bela, bûye wek diwarekî şe'fî; ne em karin kambaxkin û ne jî avakin. Ma gelo, mercên Kurdayetiye li ser me pêk tên an na..? Biserbilindî û bêfedî em karin bêjin em Kurd in ..! Bi zimanê xwe em karin bêjin welat, gel, sinor, girogirist û navên kurdî li zaroyên xwe bikin . Ma, em karin bêjin : Kardox, Lolo, Çakisor, Şêrgo, Rustem, Selahedin û Barzanî bapîrên mene ..

Di dema îro de ger Fatiş, Binefs, Rewşen, Xanim, Zin û Xecê Vegerin; wê kofiyên xwe ji serê xwe navêjin û cilên xwe neçirnin .. ; Wê qayil bin bi sinc û qenciya zarokên me ..? .

Îcar emê bêjin rehmeta Xwedê ne lê be ye gotî : « Kurd tere, û xew jere xere ». Loma em Kurd hatine nasin bi xewê, hîn ji xewa Ehil kehif me çavên xwe mist dane. Raste em hîn û hîn di xew dane; lê, wek masî çavên me vekirîne û ne rast bû dema gotin Kurd tere. Ji ber ku, em tim birçî ne, belengazin, timî li zik û...xwe miqayitin, hîn em têr nebûne, hîn û hîn em bi nêza dirûmek hiş û rûmet in, hîn em bi hesreta piyalek mirovatî û sinc in; ta em karibin nû li ser lingan rawest in .

Pêdarî di rûyê lehiyan de tamaran dixwaze, mezimbûna darê û li hember bahozan çespendina bi xakê ve dixwaze. Navêna ketinê û rabûnê mûyeke û navêna serkewtinê û derdanê Teqleke. Ye pêdar be kare avê ji zinêr derîne û serê bimîne ye ecêban bibîne .

H. Ere dibêje : « Kî ji derketina ser çiyar bitirse wê timî di kortan de bijî». Ye di kortan de jî bijî, timî lêmişt û lehi wê bi serde werin .

Helbet di roja îro de jî navê me tevan bûye Hemê tirsonek. Ne di reş û tariyê de û ne jî li ber şewla royê em karin ji mal derkevin. Ji ber ku, timî pîrhebok û dêwan rê li me girêdane. Kurdan digotin apê Faris, soza min û te li ber dolma gêris. Berê xelkê bi navê Kurd zaroyên xwe dikirin xew. Navê Kurd bûbû qehremanekî ti hêz û birûsk wî nahêjin. Lê, mixabin îroj...hîn caran jî kesekî nedigot Kurd ji dêlva digot leheng, comerd, qehreman, goran, dilovan, şer û piling. Lê, îro jî navekî me tenê heye - windonek - wax li me bêkesan. Bapîrên me digotin : « Şêr kal bû dibe pêkenokê roviyan » û « roviyê bigere ji şerekî rûniştî çetire » . Belê raste, şêrên me tev kal bûne, lê, ka ew şêrê gênc ku bi avêtinekê re axa xwe rake û hilîne. Lê, şêrên me li taliya temenên xwe digrîn, ne di ciwaniya xwe de û ne jî di meziniya xwe de karibû tişteki bike û tim jî digotin em şer in, û ezê jî tim bêjim wax li me bêkesan.

Dilovan

Darajtina .. Dûmahîk

Nimûne :

1-Kîtên bê wate : A, Ê, Û, Î, O, E, An, Ran, Onek, Van, De, Ik, Ahî, Geh, Anî... H.W.D

2-Kîtên bi wate : Dar, Stand, Stran, Der, Par, Ba .

Têbin:Danasîna kîtan bi kêrî cudatiya bêjeyên pêkhatî û hevedudanî tê .

Bêje : Ew peyv e, ku, ji kîteke yan ji çend kîtan pêk tê û xwedî wateyekê ye. Hest û ramana mirovan jî, di riya wê re, dighê mirovên din . Bêje ji aliyê binesaziye ve, parve çar beşan dibe .

1-Bêjeyên Salt : Bêjeyên salt yek kîte ne xwedî wate ne û yek derbê bi lêv dibin.

2-Bêjeyên Sade : Mirovên nikare wan ji hev bike . Ji kîteke Yan ji çend kîtan çêdibin û xwedî wate ne . yanê bêjeyên Sade yên Salt jî di xwe de werdigerin .

Nimûne : Azad, dest, stran, gir .

Têbin : Bêjeyên Sade yên pirkîte, kîteyên wan bê wate ne .

Nimûne : Azad

Em dibînin bêjeya Azad Sade ye û ji du kîtan pêk hatiye A + Zad . Herdu kîte jî vê wate ne .

3- Bêjeyên pêkhatî : Ji bêjeyê Sade û paşkîteke bê wate pêk tên . Yanê mirov dikare bibêje ku, ji çend kîtan bê wate yan ji kîteke bi wate û yek bê wate pêk tên .

Nimûne : Azadî, raket .

Azadî : Ji sê kîtan bê wate pêk hatiye (A + Zad + Î) .

Raket : Ji kîteke bê wate û kîteke bi wate (bêjek Sade) pêk hatiye . (Ra + Ket) .

4- Bêjeyên hevedudanî : Ji pevgirêdana du bêjeyên Sade du carkirina bêjeyekê yan jî ji du hêmanan (bêje û pirtikekê) bêtir pêk tên .

Nimûne:Dotmam, Pismam, bihevketin

- Em dibêjin (Dotmam, Pismam) ji pevgirêdana du navdêran, yanê ji du kîtan bêjeyî pêk hatiye . Bêjeya bihevketin ji du kîtan bê wate û du kîtan bi wate, yan jî du kîtan bê wate û du bêjeyên Salt pêk hatiyê .

Dîsa Cegerxwîn

Jan Dost



Cara yekem min helbestên Cegerxwîn di deffereke birayê xwe yê mezin de xwendin, ez, biçûk bûm û min nizanibû ku nivîsên wî qedexe ne. Dema birayê min çav li min ket ez helbestên Cegerxwîn dixwînim, weke ku bombeyekê ji dest min bigre, bi lez deftera xwe bir û got: Careke din li vê defferê nenêre!!

Min ji wê rojê de nas kir ku, ev nav wê nema ji bîra min biçe. Min li aliyekî di nas kir ku, roleke mezin ya nivîsandinê heye, heta ku, dewlet jê ditirsin. Naxwe çima birayê min bi wê lez û tirsê defter ji destê min revand û di devereke asê de veşart!!?

Bêguman Seydayê Cegerxwîn navekî mezin e, lê ev nayê wê wateyê ku, di ser rexneyê re ye, yan mirov nikare nêzikî sinorên pîroziya wî bibe. Bervajî wê yekê, her ku, lêkolîn û xwendinên rexneyî ji berhemên Cegerxwîn re bêtir bibin, wê rastiya wî bêtir zelal bibe û rol û nirxên wî werin naskirin.

Di vê nivîsa xwe de, ez dixwazim li ser çend xalên ku, ez wan giring dibînim rawestim.

Xala yekem: nav û dengê Cegerxwîn ji çi hatiye, gelo ji asta bilind ya helbestên wî, yan ji mijarên helbestên wî?

Di bersiva vê pirsê de, ez gelekî ramiyame û ez gihame vê encamê. Ji hêla hunerî de, helbesta Cegerxwîn ne ew qasî li pêş e û ji sinorê kilasîk derneçûye. Çi di helbestên xwe yê evîni de, çi di yê netewî de, û di evîne de?. Cegerxwîn kopiyekî Cizîrî, Mîna, Macin, Xanî, Feqiyê Teyran û kilasîkên mayî ye. Li wan, hevok, wêne û gotinên wan zêde nekiriye. Em dikarin gelek mînak jî binin: Di seranserî heşt dîwanên wî de, ew birûyên yara xwe yan weke hîva yekşevî, yan jî mîna kevanan dibîne, yan jî mîna tîpa dal ya erebî!!! Heta di şîna kurê xwe de jî birû dibin kevan û dal jî van her du sifetan derbas nabe. Her çendî ku, em dizanin Cizîrî di helbesteke xwe de dibêje: Min go mehê nû çasîtiyê ebrûyê yari

Go min çî hed e!! şubhetê neelê feresim ez

An go, min ji hîva yekşevî re got: tu mîna birûyên yara min î, hîvê got: ne hedê min e ez mîna wan bim, ez weke nalê hespa me!!

Di vir de em bala xwe didinê ku helbestvanekî kilasîk bi mezîniya Cizîrî ji pesindana birûyên yara xwe û şibhandina wan bi hîva yekşevî, bêzar

bûye û li wêneyekî nû digere, lê seydayê Cegerxwîn xwe di vî barî de newestand û her li ser mîratê kevin ma û gavek nû ji bo pêşketina helbesta kurdî ne avêt.

Mîna keke di ez bidim, kevnarên me, her û her bisk û kezî weke tîpa «D» ya erebî şikestî û çiviyayî diditin. Cegerxwîn ji her weha ma, li wan zêde nekir di gel ku, zanibû êdî xwendevanên Kurd berê xwe didin tîpên Latîni û şibhandina kezîyê yarê bi tîpa «D» ya erebî bêwate dimîne. Memik mîna sêv û hinar û hirmîyan diditin. Wî jî weha!! Bi sedan mînakên bi vê awayî. Mebesta min ji vê gotinê, ew e ku, bibêjim Cegerxwîn her bi teşîya kilasîkên me dirist.

Di vir de hêjaye bibêjim ku Cegerxwîn yek ji wan kesên ku, bi jîrbûn û pisporî teqlîda kevnanan dikir, ne weke gelek helbestvanê ku, li pey wî hatin û bi ser neketin.

Lê, dîsa jî dibêjim ku, helbestvanî afirandin e, ne ristina bi tevn û teşîya kesên ku, wêne berê afirandine û anîne meydana helbestvanîyê. Ev yek tê wateya beyarbûn û vêlbûna hestên helbestvan. Xala duwem ya ku ez wê pêwîst dibînim rola Cegerxwîn e: Mirov bixwaze nexwaze nikare rola wî inkar bike. Di gurkirina hestên netewî de li ba gelê Kurdistanê, xasma ku, helbestên wî di civatan de dihatin gotin bi dengê dengbêj û hozanan. Lê qet nav û deng nayê wateya bilindbûna asta hunerî ya helbestên Cegerxwîn. Milletê Kurd di serdema geşbûna agirên şoreşan de bi hacetî dengê bilind weke yê Cegerxwîn bûn. Bi hewcedarî Medyayê bûn, bi hacetî propagandê bûn, Cegerxwîn ji ev rol bi çalakî list û doza hişyarbûnê li gel kir.

Li aliyekî din Cegerxwîn dixwest gavin biavêje ji bo nûjenkirina helbesta kurdî. Lê, proje ya wî di nivî de ma, helbestin weke Heval Robson û Kîme Ez û bilî wan nivîsandin, lê xuyaye ku bingeheke wî ya toreyî xurt di vî warî de ne bû. Lewma bi ser neket û li ser xeta xwe ya kilasîk ma.

Şexsiyeta Cegerxwîn jî xwedan karîzmeke bilind bû. Li civatê lê dihate guhdarî kirin, wî dema dev ji meletiyê berda û cilên firincî li xwe kirin, fikra wî jî hatibû guhertin û dixwest şêx, axa, beg û meleyan bide ber şûrê rexneyên xwe, lê di bawerîya min de dakete asteke nizim û berê xwe da bir û baweriyên gelê Kurd yê Musulman, ango xwedê û pêximber bûne mijara gelek helbestên wî yê civakî. Ev yek jî sîucê nêzikbûna wî ji fikrên Komonîstan bû. Mijarên bi vî rengî nabin mijarên helbestan; bi gotar û lêkolînan .. D .. R .. 7

Keçel dimire gulî mor dibe !

Salih Ce'fer



Wek ku, pêşyan gotiye : keçel dimire gulî mor dibe an gulî sor dibe û hin jî dibêjin gulî dirêj dibe. Ev metelok tê bîra mirov; gava yek dimire û diçe ser dilovaniya xwe. Lê, gava yek bi kûranî li ser vê metelokê raweste û wê şirove bike; wê têbige ku, ew ne ji valahiyekê hatiye û wateyêke kûr di paş vê gotinê de heye.

Raste mirov di jiyane de nikare her tiştî ji hev re bike û di her warî de alikariya hevdu bike, lê, hin tişt hene ji dest mirovan derdikevin; gava hinek mêrxwazî hebe.

Di civaka kurdî de, wek civakeke şûndemayî û bindest ku, bi hewceyî hevgirtinê û hevbendiyê ye li hember zor û dijwariya hemû rengên bindestiyê. Mirov dinêre ku, gelek caran ev piştgirî û hevgirtina tune ye, eger carina peyda bûye jî lê, bi rengê pir hindik û qels . Helbet sedemên vê yekê jî hene. Pirsek tê bîra mirovan gava ev mijar tê ber çavan. Gelo kî ye yê di civata kurdî de kane piştgiriya civata xwe bike ? Di baweriya min de her mirovek dikare alikariya civata xwe bike. Her yek bi rengê, lê, Yê ji gişan bêtir kane vê alikariyê pêşkêş bike ewe yê xwedî imkan û defrete. Lê, gelo ev kes bi vê rolê radibe û erka xwe bi cî fine an na ? Qata xwedî sermiyan û mal di civaka kurdî de kî ye?. çima bi erka xwe ya netwî û civakî rana be?. Civaka kurdî civakeke fewdal û êlan eye, ne fewdalên Kurdan û ne jî serok êlên kurdan bi vê yekê radibin. kesê fewdal û êlperest bi çî çavî li netewa xwe dinêrin?. Ew kesên ku, ji êla xwe bêtir tu qedir û qîmetê nade kesî û ne amedeye tu alikariyê ji êla xwe bêtir bi kesekî re bike; wê çawa alikariya netewekê bike?!

Mirina kesên xwedî hest, û taybet jî kesên afrêner, hunermend, torevan, niştimanperwer, zanyar ... H.W.D, dibe wek mirina keçelê gulî mor. Di civakeke nezan û êlperest de, ên herî bê qîmet ev kes in. Serokê êlan ên fewdalek di civakê de, sed qatî bi qedir û qîmet tirin ji kesên zanyar û rewşenbîr !.

Ne dewlet mafê rewşenbîrên kurd dide û ne jî civak

Dûmahîk .. R .. 9

Dişa .. Dûmahîk

dibû. Lê, bi helbestan vê yekê dijminê Cegerxwîn pir kirin. Tê bîra min cara yekem û dawî min Cegerxwîn di şingeriya kalkê xwe de li bajarê Amûdê dît. Ew derbasî civatê bû, bi kincên xwe yên sipî, porê wî jî spî bûbû, heta sola wî jî sipî bû. Hin rûnenîştibû; bavê min yê mele berê xwe dayê û pirsî: Ma tu limêj dikî?. Ez niha pê dihesim ku, pirsra rehmetiyê bavê min ne di cihê xwe de bû. Ew li ku û limêj li ku! Cegerxwîn kenîya û got: ma rewşa min rewşa limêjê ye, û guftûgoyeke dûr û dirêj çêbû ku nayê bîra min. Nêzîka bîst û pênc salan di ser bûyerê re derbas bûye.

Civaka Kurdî civakeke nexwendî û bêsewad bû û pêwistî bi naqoseke dengbilind hebû ku, gel hişyar bike.

Cegerxwîn di dawîya helbesteke xwe de dibêje: Ey Cegerxwîn, Ehmedê xanî bi naqosa mezin Kurd nekir hişyar ji bo çî tu dinalî wek ceres?.

Ji ber vê yekê, helbest li ba Cegerxwîn roleke mezin di hişyarkirina gel de dilize. Vê nerîna wî jî hişt ku helbesta wî qels be. Ango ya pêwist li ba wî naverok bû, ne forma helbestê yan kirasê ku, peyv li xwe dikir bû. Her weha mirov dikare bibêje ku, Cegerxwîn bi zimanekî nazik ku, her kes tê digheje helbestên xwe diristin. Ew jî sedemek bû; hişt helbestên wî bibin stran û têkevin devê biçûk û mezinên gelê Kurd.

Di nerîna min de, heta demeke dirêj bandora Cegerxwîn li ser nifşên helbestvana, bi taybetî yên ku, li pey wî hatin li başûr rojavayê Kurdistanê gelekî mezin bû. Her kesî bi teşîya wî helbest ristin, ez yek ji wan bûm û min di Kela Dimdimê de bi şeweyê Cegerxwîn nivîsî zû bi zû em ji bin tesîra wî derneketin û me nikaribû xetêke xwe ya serbixwe bidîta; heta ku nifşekî nû hat û sinorê Cegerxwîn derbas kirin. Ew jî ji ber ku, haya me ji helbestvanên herêmên Kurdistanê yên di nebû. Ne tenê weha lê, piraniya helbestvanan Cizîrî û Xanî jî nas nedikirin.

Me çavên xwe li diwanên Cegerxwîn vekirin û ji wî pêve kes li meydana nebû. Ew bûbû rojek ku, stêrkên helbestê tev di ronahiya xwe de winda kiribûn.

Bi gotineke kurt ez dikarim bibêjim ku, helbesta Cegerxwîn hêjayî lêkolîneke berfirehe û mirov bi insaf nêzîkê bibe; wê genim û zîwanê ji hev derxîne. Û terazûyêke adilane hebe; wê qelsî û bilindiya berhemên wî xuya bibin. Neku bi evîndarî û pîrozî mirov nêzîkî berhemên wî bibe, ya di mirov divê jiyana wî ji helbestên wî cuda bike. Ango; ew çiqasî welatparêzekî cesûr be, şervan be, têkoşer be, nayê wateya ku, divê helbestên wî ji xwedan hunereke bilind bin.

HEVPEYVÎN

BI

ROHAT ALAKOM RE

Muhsin Seyda



ROHAT ALAKOM : Ez di roja 13.5. 1955'an de li Kaxizmanê (qezayeke bajarê Qersê) hatime dinê. Min dibistana pêşin, navîn û lise li wir xelas kir. Paşê min li Ankarê, li serbajarê Tirkiyê xwandina bilind qedand (1974-1978). Di sala 1978-1980î li Bulgarîstanê û di salên 1980-1982an de li Almanyayê, li bajarê Frankfurtê mam. Di sala 1983ê de, min koçberî Siwêdê kir. Ji wê demê heta niha li Stockholmê dijim. Qasî 15 pirtûkên min bi zimanê kurdî, tirkî û swêdî hatine weşandin. Şukur Mistefa kitêba min ya bi navê Rêxistina Xoybûn û Serhildana Agiriyê di sala 2000an de wergerand zimanê erebî û zaravayê soranî. Vê gavê di derbarê Kurdên Siwêdê de (1965-2005) xebatekê amade dikim.

Berhemên Rohat Alakom:

Dusedsaliya Kurdnasiyê (1987).
Di Edebiyata Tirkî ya Nûjen de tema Kurdan (1989).
Di avkaniyên Siwêdî de, Motifên Kurdî (1991).
Serpêhatiya Jibirkirinê: Seidê Kurdî (1991).
Di Berhemên Yaşar Kemal de, tema Kurdan (1992).
Janeke Ziya Gokalp: Kurd (1992).
Li Kurdistana Hêzeke Nû: Jinên Kurd (1995).
Di Folklorê Kurdî de, Hakimiyeteke Jinan (1994).
Kurdên Îstenbola Kevin (1998).
Rêxistina Xoybûn û Serhildana Araratê (1998).
General şerîf Paşa (1998).
Pêwendiyên Siwêdiyan û Kurdan di nav Hezar Salan de (2000).
Kurdên Anatoliya Navîn (2003).
Aristokratên Kurd: Torin (2003).
Kurdên Siwêdê (2004).

Pirsên hevpeyvînê

* **Pirs:** Di sala 1925an de Serhildana Şêx Seîd bi rengekî tirajîdî bi dawî hat û di sala 1927an de Xoybûn çêbû û biryara serhildaneke nû stand. Gelo çi guhertin di civaka kurdî de û di têkiliyên navdewletî de çêbûn da ku, serhildaneke nû bê li darxistin ?. Û heta çi radeyê berpirsiyarên Xoybûnê sûd ji ezmûna Serhildana Şêx Seîd wergirtin ?.

** **Bersiv:** Serildana Agiriyê mirov dikare mîna berdewama Serhildana Şêx Seîd bihesibîne. Çawa tê zanîn piştî ku, serhildana Şêx Seîd binket û têk çû, gelek kadroyên pêşeng û ronakbîr xwe avêtin Kurdistana Suriyê, Lubnanê û Ewropayê. Kurdandi sala 1927an de rêxistineke nû saz kirin: Xoybûn. Mirov dikare bêje angorî Serhildana Şêx Seîdê Kurd di dema Serhildana Agiriyê de zêdetir xurt bûn. Rola ronakbîran mezin bû. Bîna rêxistineke nûjen ji Xoybûnê dihat. Kurdan alikariya Ermeniyên ji girtibûn û bibûn xweyê hêzeke nû. Devera ku, Serhildana Agiriyê lê dest pê kiribû, deverek ser sînoran bû. Vê rewşê îmkânên mezin ji Kurdan re peyda dikir. Ji bo stratejîkbûna vê deverê di dawîya Serhildana Agiriyê de, hiç pêşeng û serekê Kurdan nehatin girtin. Hemû derbasî aliyê Îranê bûn. awa tê zanîn, Îhsan Nûrî Paşa bi salan li Tehranê nefî bû û li wir jî wefat kir.

* **Pirs:** Di sala 1928 hikûmeta Tirkiyê lêborîneke (efûyek) giştî derxist û vê yekê hişt ku, hin endamên Xoybûnê dev jê berdin û derbasî Tirkiyê bibin (Elî Riza, Eminê Perixanê) êdî em dikarin Xoybûnê wek rêxistineke xurt û hevgirtî li qelem bidin?

** **Bersiv :** Xoybûn piştî van efûyan belav nebû, dîsa li ser piyan ma. Lê belê ji aliyê psikolojîk ve, van bûyeran li ser Xoybûnê bandûreke nabaş hişt. Ji ber ku, ev kesên ku, veqetiyên, kesine navdar bûn, ji malbatên naskirî dihatin. Bi taybetî Elî Riza Efendî wek sembolekê di hate hesibîn, ji malbata Şêx Seîd dihat.

* **Pirs :** Di lêkolîna xwe ya li ser Xoybûnê de, te gelekî xwe spartiyê pertûkên bîranînan û car-caran ji raporên istixbaratan, ev herdu cureyên belgeyan, lêkolînan dikare çiqasî wan, wek çavkaniyêke dîrokî bikarbîne?

** **Bersiv :** Pirtûka min ya bi navê Rêxistina Xoybûnê û Serhildana Agiriyê di sala 1998an de li Îstenbolê derket. Di van salan de, di derbarê vê babetê de çi dikaribûn peyda bibûna; min xwe gihande van dokuman û çavkaniyan. Bîranînan û raporên istixbaratê bide sedî sedî nersat bin jî, lê, gelek caran jî agahdarî û zaniyariyên balkêş pêşkêşî me dikin. Ji bo ku, di van belgeyan de, gelek tişt hatine ... **Dûmahîk .. R ... 9**

Hevpeyvîn .. Dûmahîk

nivîsîn û qeyd kirin. Êdî ew bûne çavkanî. Mirov çiqas dikare baweriya xwe bi wan bîne? Ev yeka bi nivîskar ve girêdayî ye. Eger materyal û malzemeyên mayîn yên ku, li ber destê nivîskar hene; van çavkaniyên nû rast derxin (testîq bikin), wê demê mirov êdî nikare tişteki bêje. Divê nivîskar îmkana danberhevdanê (rûberihavkirin) bide xwendevanan. Hemû referans û literatûra di derbarê babetê de divê bê pêşkêş kirin.

***Pirs:** Rola partiya Taşnaq û hikûmeta firensî di Xoybûnê de çi bû?

**** Bersiv :** Him di dema avakirina Xoybûnê de û him jî di salên din de, Partiya Taşnaq roleke aktîv di nav Xoybûnê de hebû. Kurd hewcedarî wan bûn û ew jî hewcedarî Kurdan bûn. Di navbera wan de peymanê jî hatibû îmze kirin. Di binê vê dokumenê de îmzayên herdu aliyên jî hene. Min di pirtûka xwe da cih da vê dokumenê.

*** Pirs :** Mamoste Mihemedê Mele Ehmed, di pirtûka xwe ya bi zimanê erebî li ser Xoybûnê de, dibêje ku, xebata Xoybûnê di nava kurdên bakur tenê de, hişt ku, bîra neteweyî li nava Kurdên Sûryê bi derengî bikeve. Tu vê nêrîna çawa dinirxîni?

**** Bersiv :** Di van salan de çawa tê zanîn Kurd wek komekê, wek netewekî û elementekî yekgirtî dihate zanîn, bi navên perçên cihê nedihatî bi nav kirin. Wek mîsal îfadeyên “Kurdên Suriyê” an jî “Kurdên Tirkiyê” wek îro bi cih negirtibûn û nedihatî dubare kirin. Rast e, tevger, şerê germ û serhildanê bi taybetî li dorberê Agiriyê zêdetir dest pê kiribû. Lê belê di nav Kurdan de, piştgirî, alîkarî û yekdengî mezin hebû. Kurdên hemû deran didan û distandin. Hatî û çûyîneke mezin di nav Kurdên Tirkiyê û Suriyê de hebû. û di nav hevda bûn. Ji bo van rastiyan mirov nikare di nav kurdên Suriyê de qala (behs) “derengmayînen hizrên netewî” bike.

*** Pirs :** Mamoste Konê Reş, di pirtûka xwe ya bi zimanê erebî li ser Xoybûnê, çar navan li listeya damezrênerên Xoybûnê zêde dike, ew jî ev in : Xelîl Ramî Bedîrxan, Kamîran Bedîrxan, Sureya Bedîrxan û Hemze Begê Muksî. Tu derbarê vê yekê de, çi dibêji?

**** Bersiv :** Min di pirtûka xwe de dabû kîvşê ku, kîjan kesan Xoybûn damezirandine. Ev navên ku, Konê Reş pêşkêş dike ihtîmaleke mezine ku, di dalên din de ketibin nav refên Xoybûnê. Kamûran Bedîrxan û Suriyê Bedîrxan di nav Xoybûnê de, gelek aktîf bûn. Xelîl Ramî Bedîrxan kesekî hezkerî û zanebû. Rûmet û giraniyeke wî hebû. Lê, belê navê wî di komîta merkezî ya Xoybûnê de derbas nabe. Mîmkûne nexwastiye an jî xwastiye bi tehrekî din alîkariya Kurdan bike.

Ev navên wan li jêr in di komîta pêşîn de bi cih girtine:

1. Mehmed şukrî Sekban
2. Celadet Bedîrxan
3. Memduh Selim
4. Heco Axa
5. Emînê Perîxanê (Emînê Ehmed, Emînê Ramanî)
6. Elî Rîza
8. Kerîm Rîstem Beg

Serekê komîta merkezî yê pêşîn çawa gelek çavkanî û dokumen jî testîq dikin Celadet Bedîrxan bûye.

Keçel .. dûmahîk

Eger maldarek, axak an serek êlek daxwaza alîkariyekê ji civakê bike, ew daxwaza wî bi cî dibê. Çi abûrî, civakî an heta siyasî be. Lê, civak tu carî guh nade rewşenbîr û rewşenbîriyê.

Gava rewşenbîrek pirtûkeke xwe çap bike, li nav civakê bigere û bi destê xwe belav bike, ew civak qedir û qîmetê nade wê pirtûka wî û sed pereyî Sûrî jî nade wî. Lê, gava maldarek kurekî xwe dizewecîne an dikeve tengasiyekê, bi hezaran pereyên sûrî jî bo wî tîn dayîn. Ev civaka ku, ji bo pirtûkekê pêncî an sed kaxetên Sûrî (gelek caran jî nade) dide, û ji bo CDeyekê an kasêteke hunermendekî pêncî an bîst û pênc kaxetan (wê jî bê dilê xwe) dide; ev xuya dike nêrîna wê civakê li zanistiyê û ramanê û pêşketinê çî ye.

Beşek ji qata belengaz di civaka kurdî de xwedî li rewşenbîrê xwe derdikeve. Ev qata bi xwe di tengasiyeke aborî de dijî û nikare derdê serê xwe çareser bike. Bi dil û canê xwe li kêlek afirênerên xwe disekine û jê daxwaza cangoriyê dike; lê, nikare tişteki ji bilî navtêdanê jêre bike. Qata maldar ti alîkariyê bi hunermend û rewşenbîr re nake. Lê, gava yek ji wan dere ser dilovaniya xwe, bi gotinên bêpere, û bi name û birûskan rondikan li ser dibarînin. Ew kesê ku, li ber çavên wan wek keçel dihate xuya kirin, piştî mirinê dibê gulimorek. Hêvî ew rojek were, qata maldar a Kurd bi qedir û qîmet li rewşenbîrên xwe binêre û alîkariya wan bike. Ji ber gel û millet bi wan tene nas kirin, û ew çiyê serbilindiya gelan in.

Hin pirsgirêkên siyasetê Di « komar » a Eflaton de.

Mîrxan ZARA

* « Komara » a Eflaton malpereke girîng di warê sazkirina ramana siyasî de digire. Cudahiya vê pirtûkê ji hin berhemên felsefî ye ne tenê ji ber pêşkêşkirina pirsan hatiye. Lê, ji ber ku, ew di gel pirsan, bersivan jî diyarî xwendevanan dike. Û hemû pirsgirêkên ku, li hember mirovê berê di şaristaniya girîkî ya kevnar de berz dibûn çareserdike.

* « Komara » a Eflaton, roleke payebilind di felsefeya kevnare de dilize. Berya ku, qonaxa «pirsa felsefî» xwe hîlbide. Loma, di vê pirtûkê de bêtir «Eflaton» li ser şirovekirin, rexnekirin, û bersivan rawestiyaye. Û ew bi va awayê han cîhaneke ramyarî û felsefî ku, ji lihevexistina kurte pirsan û bersivên dirêj hatiye avakirin, didomîne. Çimkî li cem hemû ramanbîran, filosofan û nivîskarên gotinên amade û qutikiri nîne.

* Pirtûkê pergala hevpeyvînan distîne. Û Eflaton li ser zimanê «Sokratîs» nêrînen xwe yê cur bi cur êşkere dike.

* Li cem wî tenê pênc celebên hukûmetan hene:

Hukûmeta uristokrat.

Hukûmeta tîmarxî.

Hukûmeta oligarşik.

Hukûmeta demokrat.

Hukûmeta zordest.

Ji van pênc celebên, Eflaton forma dewleta uristokrat hildibjêre, û wê wek nimûneya herî çaktir û çêtir dibîne. Li gor wî tenê dewleta uristokrat dikare xizmeta cemwerê xwe bibîne. Lê, ew forma dewleta zordest hiç napejirîne. Di ramana wî de, ev cureyê dewletan nikare ji bilî bêzariyê, belengaziyê, û xizaniyê ti encamine berder û bi havil derxîne holê.

Jêderê dewleta zordest di vîn û daxwaza gel de tê dîtin. Eger gel pir ji destelatê hezbike û bixwaze wê bi dest xwe bixe. Hebet ê demek bête ku, nema ew êdî dikarin destên xwe ji destelatdariyê bişon û xwe ji bin bandora wê derînin. Bi wateyêke din; eger mirov girîngiyek pir zaf bide pirsê destelatê; dê encam dewleteke xirab û nebaş be.

* Li aliyê din, gelo ma derfetê heye ku, komareke baştir û mînakî bête bikaranîn?..

Bê guman, hebûna vê derfetê girêdayî ye bi destxistina kategoriya filosofan ji sehneya siyasetê re, û bidestxistina wan ji hukûm re. Li gor Eflaton,

va kategoriya han liyaqî birêvebirina dewletê û xelkê wê ye. Çimkî wan heye şert û mercên zanebûn, paqîjî, û dadmendî.

* Seba destelatdar ti helwestê li wî negirin; ew hin nêrînen û gotinên xwe sivik dike. Çiku ji bira wî neçûye çawa rayedaran jehir bi mamosteyê wî (Sokratîs) dan vexwarandin û di encamê de, wî jiyana xwe ji dest da. Loma, ew dibêje ku, ne merce filosofê pêşrew bin, divê ku, pêşrew û hukûmdar di şûnên xwe de bimînin. Lê, bi mercê ku ew bibin filosof û di warê zanistî de bixebitin.

* Ji hevgirtina herdu hêzan, ya siyasî û ya felsefî di eynî kes de; wê berhemne bi sîde bidin çî civakê û çî jî destelatê? Ji ber ku, herdu hêz di jiyana civakan de alavîne bingehîn û rodar in.

Têbîn : Teqez divê partîzan û rewşenbîrên me Kurdan, nemaze di heyama îroyîn de, sîdeyan ji vê ramana siyasî werbigirin hinekî xwe bi dîrî silogan û durîşman xînin, û siyasetên xwe li gorî pîvanên hişmendiyê bikarbin. Çimkî navê ku partî rewşenbîran ji xwe re bikin serad. Herweha navê ku, rewşenbîr jî partîyan ji xwe re bikin serad.

Ango ; me divê têgihîjtina hevtewawkirinê.

Li gor Eflaton, dewlet ne ji beşekî ji xelkê re sazbuye. Dewlet ji tevahiya xelkê xwe re hatiye holê. Wateya dewletê şakirina gel e. Û ji bo vê armancê pêwîst e ku, dewlet bi danûstandineke taybet pêşwaziya hemî dozên ku, wek kusepan li dijî rêveçûna dewletê radiwestin bike.

* Dema mirov bi awayekî baldarî li rewşa civaka Girîkî û dewletê (wek mînak: Esîna) dinêre, tê dîtin ku rewşa gel û rayedarên dewletê zêde ji hev dîr e. Lê mixabin, filosofê me, vê rewşa han rexne nake û ti dîtinên dijber di derheqê va parçebûna civakî de derpêş nake.

Li dewleta Esîna ya kevnare, navê «Esîna ya reş» hate birîn. Cukû Esîna mişte kole bû. Lê, pirsgirêka koletiyê di nivîsara Eflaton de cih negirtiye, û filosofê me bi ti awayan nêzî vê pirsgirêkê nabe.

Gelo, ma ew ji tirsê êrişê dewlemendan yê ku, berjewendiyên wan hebûna koleyan dixwaze hatiye? An daniştvaniya filosof di asta bilind ya hişmendiyê de, nahêle ku, ew ti pêngavên nêzîktêdayînê ji xelkên pêpelûka nizim re bike?.

Wêdetir, Çima ew bê helwest û hewldan li hember pirsgirêka koletiyê radiweste, nemaze ku, wî bi xwe jî taliya koletiyê di jiyana xwe de, tam kiriye?.

Ma ev ne qelsbûneke di têgihîştina wî ji azadiya civakê re?.. An felsefeya rasteqîn divê hertim di xizmeta berjewendiyên dewlemend û rayedaran de.. be?..

Lîsteyên .. Dûmahîk

III- Bi giştî, hejmara romanên kurmancî yên ku, heta niha hayê me ji wan çêbûye 77 e.

IV- Di salên 1940î û di salên 1970î de tu romanên kurmancî nehatine çapkirin.

V- Heta sala 1980î, ji bilî Erebe Şrmo, Eliyê Evdîrehman û Heciyê Cindî, romannivîsên kurmancîaxêv derneketine. Heta 1980î, hejmara romanên kurdî 7 bû.

VI- Heta sala 1990î hejmara romannivîsan bûye 12. Hejmara romanên kurmancî heta sala 1990î, 23 bû.

VII- Di navbera 1999-2003an, di çar salan de 33 roman hatine çapkirin.

VIII- Ji 77 romanên 38 heb li Swêdê çap bûne û 23 heb li Stembolê çap bûne.

IX- Kurdên sowyetê berî kurdên din dest bi nivîsandina romanên kiriyê. (Ereb Şemo, Eliyê Evdîrehman, Heciyê Cindî)

X- Piraniya romannivîsên kurd li Swêdê bi cih bûne û romanên xwe li wira nîvîsandine. (Brîndar, Mehmed Uzun, Laleş Qaso, Lokman Polat, Mahmûd Baksî, Silêman Demîr, Mustafa Aydoğan, Bavê Nazê...)

XI- Di gelek romanên de agahiyên di derheqê nivîskêr de tune ne. Ji ber wê, gelek nivîskar nenas mane. Lê piraniya wan li Ewropayê dijî.

XII- Yekem romana ku ji aliyê kurdên Ewropayê ve hatiye çapkirin, Xanê ye. (Brîndar, 1982)

XIII- Nivîskarê ku di warê romanê de herî pir berhem dane, Mehmed Uzun e. (7 roman) .

XIV- Hejmara weşanxaneyên ku romanên kurdî (kurmancî) çap kirine, 32 e.

XV- Bi qasî ku em dizanin, piraniya weşanxaneyên kurdî li Swêdê bi cih bûne. (11 weşanxane: Nûdem, Roja Nû, Orfeus, Apec, Helwest, Sara, Welat, Pelda, Jîndan, Newroz, Kurdistan)

XVI- Serê salên 90î, piştî guherîna hin zagonan ya di dema Ozal de, êdî weşanxane ji nû ve li Stenbolê jî vebûn. Piştî 1980, hemû weşanxaneyên kurdî hatibûn girtin. Piştî 1990î, ji nav weşanxaneyên kurdan ku li Stenbolê bi cih bûne, 6 weşanxaneyan di ber berhemên din re roman jî çap kirine (Doz, Siûmîr, Avesta, Pêrî, Aram, Berfîn)

XVII- Weşanxaneya ku herî pir roman çap kirine, Nûdem e (8 roman).

XVIII- Piştî Nûdemê, weşanxaneya ku herî pir roman çap kirine Roja Nû ye (7 roman).

XIX- Weşanxaneya ku cara pêşîn romanek çap kirive. Ozgurluk Yolu ve. (Sivanê Kurd-1977.

Stenbol, 112 p.)

XX- Di nav romanên ku me bi dest xistine de romana herî stûr, Bilican e. (Perwîz Cihanî, Doz-2002, 511 p.)

XXI- Romana herî zirav, Pala Bêşop e. (Xemgînê Temê, Sara- sala nivîsandinê:1983, sala çapê li ser nehatiye nivîsandin, 76 p.)

XXII- Hin romanên ku wek cildê yekem yê romanên pircild hatine çapkirin hene, lê belê digel ku wan romannivîsan piştî wê hin romanên din çap kirine jî, cildê duyem hê jî nehatine çapkirin.

1- Sorê Gulê (Silêman Demîr,1997)

2- Xaltîka Zeyno (Medenî Ferho, 1998)

XXIII- Ji nav romanên ku me bi dest xistine, du romanên ku ji gelek cildan pêk tê hene.

1- Sê şev û sê roj, Xezeba Azadiyê, Wêran : Sê cild (Laleş Qaso, Nûdem-1999, Pelda-2000-2002).

2- Hawara Dîcleyê : Du cild (Mehmed Uzun, Avesta-2001-2002)

XXIV- Hin romanên kurdî berê bi zimanin din hatine nivîsandin û bi dû re wergeriyane kurdî. Romanên ku berê bi zimanin din hatine nivîsandin (bi qasî em dizanin) û bi dû re wergeriyane kurdî ev in:

1- Zeviyên Soro (Nacî Kûtlay), berê bi tirkî hatiye nivîsin û ev yek di çapa wê kurdî de hatiye diyarkirin.

2- Hêlîn (Mahmûd Baksî), berê bi swêdî hatiye nivîsin û ev yek di çapa wê ya kurdî de hatiye diyarkirin.

3- Çiyayên bi xwînê avdayî (Bavê Nazê)î berê bi erebî û rûsî hatiye çapkirin û ev yek di çapa wê ya kurdî de hatiye diyarkirinê

XXV- Ji ber ku kurd dîrî hevdu mane û tîkîliya berhemên û xwendevanan li ser pîreyên serrast nehatine avakirin, civandina navên romanên kurdî jî bi qasî civandina hemû romanên kurdî zehmet e.

XXVI- Çapemeniya kurdî, xwe ji hin romanên re kerr kiriyê.

XXVII- Kêmhejmarî an jî pirhejmariya romanên kurdî asta wan ya hunerî diyar nake. Ji ber ku gelek romanên kurdî gelekî dîrî qaideyên romannivîsînê mane. Hayê gelek romannivîsên kurdî ji tevna romanê, zimanê edebî, ferqa çîrok û roman, vegotina bûyeran û kronolojiya wan, şayes, psikolojiya lehengan û bikaranîna teknîkên romannivîsînê tune. Mirov dibêje qey gelek jî wan qet roman nexwendine û dest bi nivîsandinê kiriyê.

De rabe ...

Ronî Elî

De rabe ...

An siwar be .. An peya be
Bigre .. An berde
Bikuje .. An dil bi ser de ...

Di koşkê giyanê dilê teliz de,
Daniştî nemîne ..

Di govdeyê jar û zebûn de,
Bihostan nepîve,
Û Xençeran daneçikîne ..
Di birûska çavên melûl de,
Bazara kujtinê nede û nesfîne
De rabe ...

De rabe ...

An siwar be .. An peya be ...

Demên girgîn, şevên avis
Di kovana pišta bê bav de
Har neke ..
Sirûda goristana xwenên Buharê
Pif neke,
Û di sirtê mila xûz de
Neqêrine,
Nelîline,
Û nebişkivîne ...

De rabe ...

De rabe ...

An siwar be .. An peya be ...

Di derlîg û zendikên şevê de,
Hêlan neke ..
Karwanê Kujtiyên dil ketinê,
Di navbera mij û mijgulan de
Siwar neke ..

Di quncik û pêsîra xewê de,
Netevize,
Nekeve,

Û keserên serê sibehê nerevîne
de rabe ...

De rabe ...

An siwar be .. An peya be ...

Bi rêber û lehengên rêxistinên Avê
re,

Peşkê di perçeyên mejiyê niv perçe
de

Ne avêj û çeneke ..

Bi Siltan û dema bê dem re,

Mêzîna pîvana pişka xwe,


Ji mofirkên stûyê bê mofirk,

Li ser sîngê birîştî,

Hew deyne û veke

De rabe ...

An siwar be .. An peya be ...



Hêviyên Xaçkirî

Şevyar

Kovanên min...
ji kevnetorê çavên te ne.
jiyana min ya xaçkirî
ji berhemên
bêdengiya te ye
di tariya evîna te de
li berbangê digêrim
di gulmên te de
stranek ker im..
peyvek giran im
bi qasî "Kurdistan"
li azadiya lêvan
digêrim
û di şaristaniya..
memikên te de
destnivîsek pîroz im
di bin toza
leylana bajarekî de
veşirtî me..
li pêxemberekî digêrim
ku, hêviyên min..
bighîne... ronahiyê!

Xwendevan û
Nivîskarên hêja

Birast, gelek name,
gotar û helbest gihane me,
lê mixabin, me nikarîbû
wan di vê hejmarê de belav
bikin. Lê, ew di bîra mede
ne û wê di hejmara bê de,
bêne belav kirin .

DENG

Pirtûkên nû

FERHAD IÇMO

LANDIK

2

HELBEST>N ZAROKAN

EV pirtûka helbestê Ku,
helbestvanê hêja Ferhad
Içmo bo zarokan çap
kiriye ..

Em jî ~ DENG – vê
berhema hêja Ferhad
dinirxînin, û hêviya
pêşkeftinê jêre dixwazin

Hêviya min

Selah mihammed

Helbest – 2

Em bi navê weşana
DENG vê berhemê li hêja
Selah û pirtûkxana kurdi
pîroz dikin .

Firoz be

Bi hatina sersalê, em vê
sala nû li xelkê Cihanê, û
bi taybetî li gelê Kurd pîroz
dikin .

DENG

Azadî ji girtiyên welatparêz di welêt de yên konevanî û nêrînê